

MAFÊN WEKHEV JÍ BO JÍNAN Û MÊRAN

Li gor zagonê Elmanîya yê jin û mér xwedîyê mafê wekhevin.

Mafê gişt kesane ku jiyanek bê şidet hebin.

Ev bo tevahîya kesên ku li Elmanîya dijin, sadiq e.

- Nabe ci jin/ mér û an zarok bikeve ber şidet an destdirêjîya seksî. Ev babete nava malbatê û dema zewacê jí sadiq e.
- Nabe ci jin/ mér û an zarok mecbûr bibe ku leşê xwe bifroşe.
- Di Elmanîya yê de ziwaca mecbûrî, ne zagonî ye. Kesên ku ev karî bikin, tawanbar têne naskirin.
- Sinet kirina jinan û keçan di beşa endama seksî de, zirarek giran bo leşî tê hesibandin û heta 15 salan cezayê zîndanê li ser heye. Her kesê ku ev karî bike û geş bike û beşdar be, tawanbar e.

Eger rastî destdirêjîye hatin û an bûne şahidiyê dîmenên wisa, dikarin hertim gel polîsan û an telefona alîkarîyê, pêwendîyê bigirin.

Telefona alîkarîyê, xizmetên rabêja belaş bi zimanên cûda pêşkêş dike. Herwisa di hemû bajarên mezin de navendên rabêjê hene.

Eger dijî şidetê bisekinin û an ji polîs û telefona alîkarîyê, destekê bistînin, ev babetane ci bandorekê nadanê ser rewşa rûniştina we li Elmanîya yê!



Telefona Alîkarîyê di seranserî Elmanîya yê

08000 116 016 belaş/Şevûroj

Polis

110 belaş/Şevûroj



TERRE DES FEMMES saziyek xêrxwazî ye, ku ji bo mafê keçan û jinan dixebeitin. Agahîyen bêtir liser TERRE DES FEMMES ê dikarin di malpera jêr de bibînin: www.frauenrechte.de

KURMANJI